03 FEV. 2000
03 FEV. 2000

K'EREMÊ ANQOSÎ

# SOZÊ HEQÎQETÊ ÊZDÎTÎ

# DUNÊ ÎRO SÎBÊ

Institut kurde de Paris

KL
7

# K'EREMÊ ANQOSÎ

# SOZÊ HEQÎQETÊ ÊZDÎTÎ DUNÊ ÎRO SİBÊ

Institut kurde de Paris

Institut Kurde de Paris

LIV. KL. 497
27/04/2017
270 ANQ SOZ


K'EREMÊ ANQOSÎ

# SOZÊ
# HEQÎQETÊ
# ÊZDÎTÎ
# DUNÊ ÎRO SİBÊ

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

P'irtûkxana êzdiya
N10
T'ilbîs
1999



Institut kurde de Paris

Bi navê Êzdanê Sor!

Dîn-h'ebandina êzdiya p'ir kemne, ji k'ûraya t'arîqê tê, qedîma-qedîmtire. Bona wê yekêye, wekî êzdî bi K'ubarî û qure-qut'an h'emû dema dibêjin: "Dînê me ser h'emû dîna r'a ne!"

Ola, bawariya êzdîtiyê bi kaklê, binga xa pêşiya dînê Cihûya, Xaç'p'arêza û Sirmana di dinê da diyar biye. Êzdîtî dînekî pêşk'etî bû û ewî berî h'emû dînê kemn û t'eze yek Xudê çava Xaliqê A'lemê, E'frandarê dinê h'eband û bawariya xa pê anî. Di zemanê kemn da Xudê p'ir' bûn. Bîr û bawariya êzdîtiya t'eze ew h'emû Xudê kirine Xudan, Mêr, Miliyak'et û dane dora yek Xudaê Mezin. Gotin: "Xudê yeke, bê şirîk û bê hevale, qencî û xirabî t'enê ji destê Wî tê!"

Zeman ser zemana da dihatin û diçûn. Her zemanekî bîr û bawariya t'eze angorî fikir û fe'mê mervê wî zemanî taanî û bela dikir. H'ebandinê kemn bi zorê p'ûç' dikirin û devsa wan ol û erk'anê t'eze der dixistine meyîdanê. Vî t'eherî dînê Zeret'ûştraê, Cihûa, Xaç'-p'arêza, Sirmana, Bûdaê derk'etine dinê û pêş k'etin.

Lê kaklê bîr û bawariya merivaye kemn t'u yekê jî nikar bû di k'okê da biqetanda û k'af-k'ûn kira. Lema jî mane neç'ar binge bihiştana û ser da tiştê h'ebandina t'eze ava kirina. P'êxemberê nûderk'etî t'enê wî cûreyî karibûn cimae't dora xa t'op kirina û peyî xa bibirana.

Dînê êzdîtiyê jî, wek yê mayîn, ji wê qedera guhastinê xilaz nebû. Dewra ku bedîla sirmaniyê r'a bû û zor dane h'ebandina êzdiyaye kemne

k’av-k’ubar, êzdî neç’ar man bîr-bawariya zork’arê sirmana hildana ber h’esaba. Li hevk’etineke p’ir mezin der k’et û çend sedsala k’işand. Gele êzdiya serê xa gorî (qurbana) xayî kirina dînê xa kirin. Ro bi ro bên û ciyê êzdiya teng dibûn. Dergek gere ber êzdiya vebiya.

Çava di qewl û beyît’ê êzdiya da têne gotinê, hema di e’yînî wî waxtî da şêx Adî û hevalrêviyê wî, xeyîd bû yan jî çi, ji êla e’rebê serbajarê Xelîfeta sirmaniyêye wê demê Şamê der k’etin hatine ser e’rdê êzdiya, H’ekarê êwirîn.

H’ekar ciyê ç’iyayê bilinde û h’ezara sala berî hatina şêx Adî li wê derê binga h’ebandina êzdîtiyê hatibû danînê. Mix’arê (şikeftê) ç’iyayê H’ekarê da kuç’ikê p’arêziya êzdiya, ziyaretê wan hatibûn çê kirinê, li k’u jî K’oç’ek

Institut kurde de Paris

û Xasê êzdiya e'babetî Xudê dikirin û kuç'ik(agir) û nîşanê dînê xa xayî dikirin.

Şêx Adî û Cindiyê wî "ji dewrana dewran birîn", bi di'a-dirozgê xa, bi sofîtiya xa, r'abûn-rûniştandina xa va dilê dîndarê H'ekarê k'irîn. Êzdiya şêx Adî nas kirin, qebûl kirin û bawariya xa jê anîn. Peyî wê yekê r'a êzdiya bi rêbirtiya û serk'êşiya şêx Adî ziyareta xaye qedîm Lalişa Nûranî bi zorê ji destê dijmina der xistin û Dergê Lalişê û Mora Kaniya Sipî h'emû êzdiya r'a careke dinê ve kirin.

Şêx Adî di Lalişê da bû serk'arê h'emû êzdiya û h'uk'umdarî hilda destê xa da. Şêx Adî û hevalrêviyê wî di zemanê xa da merivê zor xandî, zane, ulmdar û h'ak'im(fîlosof) bûn. Wana xandina e'rebiye fire di mek'teb û medresê bajarê Şamê da sitandibûn û însanê



Institut kurde de Paris

navdeng bûn. Angorî xastina demê û çetnayîya h'ebandina dînê kemn, şêx Adî dest pê kir guhêzî kire di nava bîr-bawariya êzdiya, ayîn û qirar-qanûnê dînê êzdîtiyê t'eze kir.

Şêx Adî û şagirtê wî êp'êce têrmê (giliyê) e'rebî û ferzê dînê sirmaniyê ji Quranê, k'itêba sirmaniyêye pîroz, hildan û ser êzdiya kirine ferz. Qewl, beyît', di'a-dirozge êzdiya r'a serî da sewirandin û pê xeberê e'rebî xemilandin. Ol û erk'anê êzdiyaye kemn jî guhartin: di nava êzdîxanê da h'ed û sed danîn, şêxtî, p'îrtî, mirîdtî, sê h'erf, xûşk û biratiya axretê , sunet, mîrtiya şêxa, dîwana şêxa, k'eşkûla Şêx Adî kirine ç'ara serê êzdiya.

Şêx Adî navê Mêr-Miliyak'etê, Xudanê kemn danî ser her şagirt û hevalr'êviyê xa, cidê t'eze çê kirin û her yek ji wan cida ser binga



Institut Kurde de Paris

kuç'ikê kemn cî-war kirin û maşê wan ocaxê kemn dane destê yê t'eze eşkere kirî. Şêx Adî derecê cûre-cûre kire destê her hevalr'êvî û t'erefdarekî xa, milk' û warê wan di Lalişê da k'ivş kir. K'itêbê derheqa dîn-h'ebandina êzdiyaye kemnar şeûtandin, lê yê t'eze nenîvîsîn û xandin êzdiya r'a guneh, qedex'e kirin. T'enê îzn dane mala şêxê şêx Îsna bixanda. Çava êzdî îro jî dibêjin: "Qelem, qelema şêx Îsne!"

Dema ku Şêx Adî hate di nava êzdiya da û xa weke p'êxemberekî wan danî, gelek çetnayî ber wî p'eyîda bûn. Carekê va guhartina fikirê, nêt-meremê êzdiyaye kemn ha hêsa nebû. Pirsê qebîltiyê, berektiyê, serk'artiyê, h'ebandinê, k'oç'ektiyê, xayî kirina ocaxa, p'arêzxana (ziyareta) û tiştê mayîne civakiyê nêta ku Şêx Adî pêşiya xa danî bû bar giran û aloz dikirin.



Institut kurde de Paris

Şêx Adî, wekî êzdiyê, yê ku h’ebandina û bawariya t’eze hildabûn, bin qolê xa da bigirtana û h’uk’umî ser wan bikira, hilda, çava me jorê got, êzdîxane ser şêxaniyê, p’îraniyê û mirîdaniyê p’ara ve kir. Şêx, p’îr û mirîd ji hev cida kirin û zevaca şêxa, p’îra û mirîda hev r’a guneh û qedex’e kir.

Lê, hê ewa jî t’êrê nedikr. Şêx Adî baş zanî bû, wekî we’dek dibe bê û zevaca şêxa, p’îra û mirîda hev r’a bibê nebê wê çê be û H’ed û Seda k’ivş kirî wê hilşê. H’ed û Sed ku r’a bû, bikî-nekî êzdî ji bin h’uk’um û bawariya ewî t’eze danî, e’seyî wê jê derên. Bona zevt kirina êzdiya Şêx Adî r’a bû ferzê xûşk-birê axretê kire di nawa êzdiya da. Bi vî ferzî va şêxanî, p’îranî û mirîdanî p’are-p’ar kirin û dane sondê.



Institut kurde de Paris

Şêx Adî t'imamiya şêxaniyê kire sê qebîla: Adanî-mala şêx H'esen (Îsn), Qat'anî-mala şêx-û-Bek'ir, Şemsanî-malê şêx Şems-êd-Dîn, şêx Ferx-êd-Dîn, şêx Sica-êd-Dîn û şêx Nasr-êd-Dîn. Adanî, Qat'anî û Şemsanî yek kire merebî û birê axretêye yekê. Zevaca şêxê Adaniyê, Qat'aniyê û Şemsaniyê bi wê me'nî hev r'a qedex'e kir û malê wan şêxa ji hev cihê kir û dûr xist. Peyî r'a qirarek der xist wekî mala şêxê Reş(Cinteyar), ji qebîla şêxê Şemsaniyê t'enê gere di nav malê xa da bizevciyana.

Bi vî t'eherî Şêxanî hatine p'are ve kirinê. Êdî t'ifaqa, hev girtina şêxa sist dibû. Qebîlê şêxa ji dûrî hev xistin û yek r'a kirine ber yê mayîn. Paşî wê yekê şêxaniyê êdî t'u waxtî nikar bûn t'ifaqa xa tê kirana yek û ser r'ê û

rizmekê fikirê xa pêş xistina. Her qebîleke şêxaniyê dest pê kirin ber bi cidê xa da k'işandin: Adaniyê digot h'uk'um û k'iriyameta şêx Îsn (şêx H'esen) zêdeye, Qat'aniyê digot yê şêx-û-Bek'ir zêdeye, Şemsaniyê digot yê Şems-ed-Dîn, Ferx-êd-Dîn, Sica-êd-Dîn, Nasr-êd-Dîn zêdeye.

Şêx Adî qirar p'îraniyê r'a jî der xist. Mîr Hesneman anî kire p'îrê çil malê p'îra û zevaca mala p'îrê Hesneman malê p'îrê mayîn r'a kire guneh. P'îrê malê Mîr Hesneman t'enê gere di nav malê xa da hev bizeviciyana. Qirarê Şêx Adî p'îranî jî ji hev qetandin. Yek kire p'îrê (hostaê) yekî mayîn û zevaca wan p'îra jî hev r'a qedex'e kir û yek ser yekê r'a girt. Bêt'ifaqî û ç'e'vnebarî k'ete di nava p'îraniyê da jî.



Institut kurde de Paris

Çi ma ser mirîdxanê, Şêx Adî mirîd di nav ocaxê şêxa û p'îra da p'are ve kir û her maleke mirîda Xudanê xa r'a, Mevlae xa r'a, Hostae xa r'a şa dibû. Îzna mirîda hebû t'enê mirîda r'a bizeviciyana.

Bi qirarê şêx Adî êzdî di t'imamiya xa da yek bû mirîdê yekî mayîn. Mirîdxane bû mirîdê şêx û p'îrê xa. Şêx, ji aliyê xa da, xaxa jî bû mirîdê şêx û p'îrê xa. P'îr jî, ji aliyê xa da, bû mirîdê şêx û p'îrê xa. Yanê, êzdî h'emû kirine yek mirîdê yekê. Mirîd borcdar bûn guhdariya şêx û p'îrê xa bikirana û salê carekê xêr bidana şêx û p'îrê xa û tê kirina di k'eşkûla Şîxadî da.

Bi şertê wan qirarê şêx Adî, di nava êzdîxanê da şêxtî, p'îrtî û mirîdtî ji bava derbasî ser kurqîza dibû: zuretê şêxa dimane şêx, zuretê p'îra dimane p'îr, zuretê mirîda dimane mirîd. Her



Institut kurde de Paris

yek ocax û kuç'ikê malê şêx û p'îre bavê xa r'a dihatine girêdanê. Di vî h'alî da her êzdîk gere ber bi cidê xa, Xudanê xa û t'erîqê xa va biçûya, xûna wan t'u waxtî t'evilhev nedibû û êzdî nedigihîştine hev. Yekbûn û t'ifaq êzdiya r'a t'ucar çê nedibû û h'uk'um kirina ser wan, bin qolê xa da girtina t'imamiya êzdîxanê edî hêsa û r'eh'et dikarî çê biba. Wan qirara, yê ku şêx Adî danî, ne mecal didane êzdiya ji hev û dû biqetiyana, ne jî dihişt xûna êzdiya biba yek.

Çaxê şêx Adî danîna h'ed û sedê, ferzê xûşk-birê axretê, p'are ve kirina civaka êzdiya di nava êzdîxanê da anî sêrî, t'imam kir, k'oç'ekê ber kuç'ikê ocaxê pîroze kemn ji dereca xizmeta Xudê û dîn dûr xist û tebeka wan k'af-k'ûn kir.



Institut Kurde de Paris

Peyî r'a, şêx Adî îzn da t'enê şêx û p'îra ulmê ku ewî sêvirandî bû, bigotana û qirarê ku ewî bana dîn-h'ebandinê êzdiya r'a danî bû, biqedandana.

Herwisa, şêx Adî zanebûn, mak(şiro) ve kirina h'eqîqeta(rastiya) Xudê, ulmê Şîxadî, xizmeta r'ê û rizmê h'ebandina dînê êzdîtyê kire xurê û toqê sitûyê t'ek t'erîqetiyê. Çi şêx û p'îra ezberî, bi devkî êzdiya r'a digotin, her ew bû.

Lê çava di ulmê dînê êzdiya da tê xivîyanê, şika şêx Adî kirinê xa û yê şêx û p'îra r'a h'eta-h'etaniyê nedibirî. Bona wê yekê bû ku di qewlê "Îmanê" da da gotinê: "Ew bedîlê der k'evin, ew bedîlê hev k'evin...,ew bedîlê Mêra bikine şike..."



Institut kurde de Paris

Hema di qewlê “Îmanê” da hene du sebeqê mayîn jî:

“Bê zemanê neçêye,

Xof, rema Xudê hilê dinêye,

Bira bike xeyîbeta birêye.

Bê zemanê kivîre,

Xof, rema Xudê bike bîre,

Dijminê dîn bibin şêx û p’îre.”

Xulese, di we’dê xa da şêx Adî û şagirtê wî civaka êzdiya, êzdîxane, ser h’îmê derîgirtî ava kirin, kesê xerîb qebûl nedikirin. Êzdî gere t’enê t’ek ji dê û bavê êzdî bît’er ba ser e’sasê h’ed-sedê û xûşk-biratiya axretê.

Wan qirarê şêx Adî r’ê û mecal nedidane êzdiya ji hev biqetiyana û ji dînê xa derk’etana, çiqasî jî sirmaniyê zor neda wan. Cî-warê



Institut kurde de Paris

êzdiya ji yê sirmana cida bû. Êzdî di welatekî, gundekî da başqe diman û qet t'evî sirmaniyê nedibûn. Qirarê dîn, r'abûn-rûniştandinê, xarin-vexarinê, xa kirina k'inc-cila, rengê p'erç'e jî başqe bû. Zevaca êzdiya t'enê êzdiya r'a dibû û êzdiya xa dûrî sirmaniyê û xaç'p'arêza (fila) xayî dikirin.

Di dewra sedsalê navîn da qirarê t'eze, yê ku şêx Adî û Mêrê wî êzdiya r'a danî bûn, h'ebandina dînê êzdiyaye kemn pêş xistin û wî cûreyî k'oma êzdiya (êzdîxane) ji h'elandinê, sirman bûnê xilas kirin û êzdîtî di h'alê çetin, lêdan-kuştinê da xayî kirin. Şêx Adî û heval-r'êvî, şagirtê wî gelek şert û qewlê qenc, sozê kêrhatî bona cimae'ta êzdiya sêwiran dibûn û dil û fe'mê êzdîtiya da cî kiri bûn. Ewana



Institut kurde de Paris

ayîna êzdiya r'a bûne sitar û h'eta roja îro jî êzdî êzdîtiya xa pê wan yeka xayî dikin.

Herneyîse, şêx Adî û Mêra bi kirinê xa va xêreke mezin nefsa xa r'a û êzdiya r'a kirin. Lê alîkî mayîn va, wekî em k'ûr bifikirin, şêx Adî dewsa ku dîn-h'ebandina êzdiya fire belayî kira, bi zora ayîn-qirarê t'eze dîn û civaka êzdiya teng kir. Îzn neda êzdiya kesekî xerîb di nav xa da qebûl kira, nehişt kes ser êzdiya da zêde ba û yekî neêzdî bîr-bawariya êzdîtiyê qebûl kira. Ji êzdîxanê jî k'ê diçû, pajda vegerandina wan t'une bû. Di wî h'alî da refê êzdiya kêm dibûn.

Ser qirar-ayînê şêx Adî danî, pêşk'etin û guhastinê angorî dewr-zemana di bîr-bawariya dînê êzdiya da nikar bûn çê bana, dîn-

Institut kurde de Paris

h'ebandina êzdîtiyê paş dixistin û êzdîxane di nezaniyê, te'riyê da dihiştin.

Xêncî wan tişta, meniya paşmayîna êzdiyaye herî mezin înk'ar, qedex'e kirina xandin-nivîsandinê bû. Şêx Adî û Mêra qelem êzdiya r'a kirine guneh û êzdîxane bê deft'er û k'itêbê dînh'ebandinê hiştin.

Sebeb ew bû, wekî di ulmê şêx Adî da, k'îjan jî ser êzdiya da kiri bûne ferz, hebûn me'nî û nedixastin êzdî rastiyê pê bih'esiyana. Hema bona wê yekê bû wekî k'itêbê dînh'ebandina êzdiya nenîvîsîn û ne jî îzn dane êzdiya peyî xandinê biçûna.

Bedîl ser bedîla r'a derbaz dibûn. Sirmaniyê qewata xa hil da bû, dora êzdîxanê girti bû û zor dida h'ebandina êzdîtiyê. Ber derbê sirmaniyê qelş k'ete di bîr-bawariya êzdîtîyê da



Institut kurde de Paris

û civaka Şêx Adî û Mêra bona êzdiya ava kirî bere-bere dest pê kir ber hilşandinê çû. Bin darê zorê hine êl-e'şîrê êzdiya t'erka qirarê dînê xa, şêx û p'îrê xa didan, diqulibîn diçûn dibûne sirman, k'itêba Quranê datînina ser serê xa û dikirne sonda xa. Kavrana êzdiyê qulibî dewr peyî dewrê r'a zêde dibû.

Êdî qewata Ayîna dînê êzdiya, H'ed û Seda şêx Adî danî bû, nikar bûn êzdî ji dîn der k'etinê zevt kirina. H'uk'um û zora wan zeman peyî zemana r'a ser êzdiya kêm dibûn. Êzdîxanê edî nikar bû xa t'ek û cihê xayî kira. E'rdê êzdiya, gundê êzdiya, zevî û zozanê êzdiya yê sirmaniyê r'a tevlihev dibûn, sînor ji navbera wana da r'a dibû. Bona h'ebandina bîr-bawariya dîn bira ji birê cida dibû, dijmintayî

Institut Kurde de Paris

dik'ete di nava wana da. Sirmanî hat bû xezebê serê êzdiya.

Dîndarê êzdiya ji tirsa inda bûna dînê xa, neç'ar diman, malê xa k'oç' dikirin diçûne welatê xerîb, li wan ciya ku jî h'uk'umê sirmaniyê t'une bû.

Hema eva yeka bû me'nî, wekî pareke êzdiya 100-150 salî pêjda ji destê zulma sirmaniyê ji welatê kal-bava, Romê, r'evî hate ser e'rdê Ermenîstanê û Gurcistanê yê ku wî waxtî di bin destê, qolê ûrisa da bûn.

Li ciyê t'eze jîîna êzdiya êdî t'evî şile'tê: ermen ya, gurca, ûrisa û miletê mayîne xaç'p'arêz derbaz bû. Dewr jî xaş hate guhastinê-êzdî peyî xandinê çûn. Li welata çûyîn-hatina êzdiya û dayîn-sitandina wan miletê başqe-başqe r'a êp'êceyî berfireh bû Bîr

Institut kurde de Paris

û bawariya, fe'm û fikirê êzdiya angorî zemên pêş k'et û dinê ber ç'e'vê wan fire bû. Êzdiya bi ç'e'vê xa dîtin û fe'm kirin, wekî miletê xayî nivîs û xayî k'itêb bi h'emû aliya va ser dik'evin.

Raste, li welatê ûrisa, di nava miletê xaç'p'arêza da, êzdî ji zora sirmaniyê û k'itêba dînê wane pîroz Quranê xilas bûn, lê niha k'itêbê pîroze mayîn-Încîl (Bîbliya) û yê mayîn k'etine ber ç'e'vê êzdiya.Êzdî gav bi gav, roj bi roj dik'evine bin bandûra piropaganda xaç'p'arêziyê, yex'oviyê, pirotêstantiyê û xa bi wan dînh'ebandina digirin.

Ji me'niya t'une bûna k'itêbê qirar-qanûnê dînh'ebandina êzdiya,êp'êce tişt ji Ayîna dînê êzdîtiyê tê ji bîr kirinê û unda dibin.



Institut kurde de Paris

Li welatê ûris, ciyê ku êzdî îro tê da dijîn, gelek girê û asteng êzdiya r'a çê bûnê. H'ebandina dînê êzdîtiyê gihîştiye h'alekî usa çetin û bêç'ar, wekî qirar-qanûnê dînê êzdiya hêdî-hêdî sist dibin û H'ed û Seda, Sê h'erfê şêx Adî û şagirtê wî di nava êzdiya da danîbûn bere-bere hildişe.

Êzdî êdî ser r'ê û rizmekê nesekinne. Her t'erîqek-şêx be, p'îr be, ber bi cidê xa da dik'işîne, ya xa çava qirarê rastiyê îzbat dike û ser êzdiya dike ferz.

Êzdîtiya îro ne êzdîtiya zemanê kemne. T'erîqetiyê qedrê şêxtiyê û p'îrtiyê di nava êzdîxanê da xaxa bi destê xa êxist. Ji şêx û p'îra h'ezarî yek wekî xa ulmê Şîxadî digire. Êdî ne şêx mevlatiya heq-rastiyê dike, ne p'îr hostatiya



Institut kurde de Paris

heqîqetê dike, ne jî mirîd borcê mirîdtiya xa diqedîne.

T'erîq Ayîna dîn, qirarê H'ed û Sedê, Sê h'erfa, Ferzê xûşk-biratiya axretê di nav xa da jî qet qenc xayî nakin û ne jî t'alaşê pê dik'işînin: Şêx şêxê merebiyê xa r'a û xûşka axretê r'a dizevice, şêx mirîda r'a dizevice, şêx p'îra r'a dizevice, şêx şile'tê r'a dizevice. Eva êdî sê bava da şêxê Şemsaniyê û Şêx-û-Bek'ira (Qat'aniyê) hev dizevicin. Peyî wê yekê r'a jî hê t'erka şêxtiyê, êzdîtiyê nakin, dibêjin-çi biye, em Şêxin, em êzdîne, û di nava k'oma êzdiya da disekinin, têne ser miriyê êzdiya, şêxtiyê dikin, ciniyaz dişûn û sunet dikin, xêrê hildidin.

P'îranî jî ji şêxaniyê kêmtir nake. Tirs û xofa qirar û ayîna dînh'ebandina êzdîtiyê di nava



Institut kurde de Paris

p'îra da jî r'a dibe. P'îr hostayê xa r'a-p'îrê xa r'a dizevice, p'îr şêxa r'a, mirîda r'a, şile'tê r'a dizevice.

Mirîda jî ç'e'v dane şêx û p'îrê xa û xa dane ser wê r'iya nerast û neqenc.

Êzdî ji heq r'iya dînê xa dertên û xa r'a vî h'alî h'elal dikin, e'detê dînê êzdîtiyê digivêzin. Xûna êzdiya şêlû bû. Sitûna (Erkana), ser çi jî şêx Adî û Mêra êzdîxane ava kirin, diheje û jor da tê xarê. Çi ku şêx Adî êzdiya r'a kiri bû qirar, sond û bawarî, êdî bere-bere unda dibe diçe.

Ji aliyê pirsê dînh'ebandinê da mirîd, şêx û p'îr êdî hev bawar nakin, hev r'a dik'evine şikê û t'evqê xa ji hev diqetînin.

Şêx û p'îr bona nanê zikê xa t'erka mirîdê xa didin û k'oç' dikin diçine welatê dûr.

Institut kurde de Paris

Mirîdxane bê t'erîqê kal-bava dimîne û neç'ariya xa yan gere destê xa bigivêze yan jî, çava naka biye e'det, qet destê xa navêjine t'u şêx -p'îrî,bê şêx û bê p'îr dimînin. Ew şêx û p'îr jî yê ku bona k'ara cêva xa şêxtiyê–p'îrtiyê dikin, ulmê Şîxadî, Ayîn-Qirarê dînê êzdîtiyê kêm dizanin û ji qewata wan dere h'uk'umî ser mirîdxanê bikin. Rastiyê bêjin, şêx û p'îrê îro di nav me da sekinîne, bûne şêx -p'îrê miriya, ne yê saxa.

Îro ew we'de hatiye-çava xaxa ulmê Şîxadî da têne gotinê - êzdîxane wê hev k'eve, êzdî wê ji hev birevin û sonda êzdîtiyê wê bîr kin. Biye bavo bavo. Îro ewî zemanî ser me êzdiya da girtiye. E'rd êzdîtiyê r'a biye risas û e'zman jî biye t'as.



Institut kurde de Paris

Di dewra me da şêxtî, p'îrtî bere-bere r'a dibe û ber bi h'elandinê, t'unebûnê diçe. T'enê navê e'sl û qebîlê şêxa û p'îra tê k'ivşê. Zûtirekê wê ew jî unda be. Ew roj jî wê tê gava kes wê t'unebe k'ê bikarbe şêxtiyê û p'îrtiyê bike, ulmê Şîxadî bizan be, ferzê şêxtiyê-p'îrtiyê ser rastî û qirarê şêx Adî û Mêra biqedine. Êzdîxane jî hê qe şayîşa nak'işîne, ser guhê xa razaye.

Çava e'mrê îro nîşanî me dike, guhastinê angorî demê gere bik'eve di nava dîn-h'ebandina êzdiya da jî, wekî êzdî naxazin di nav dîn û miletê mayîn da bih'elin û unda bin. Dîndarê êzdiya gere bigihîjine wê nêtê, baş fe'm bikin û hildine ser h'esaba.

Îro bi h'uk'umî Xudayê Mezin û qevata horî-meleka bona xayî kirina dînê êzdîtayê



Institut kurde de Paris

r'êk me r'a tê xiviyanê, r'êke dûr-dirêj, r'iya serk'etinê û pîroziya dînê me. Bînaya Ç'e'va vê r'ê dide pêsiya me-êzdî gere vegerne ser k'ok û e'sasê dînh'ebandina xaye kemne berî hatina şêx Adî û cindiyê wî. Pê r'a jî gere bîr û bawariyê t'eze çê bin angorî pêşk'etinê diniyayê, nêt–meremê dewir-zemên, tebekê û derecê xandin, zanîn û fe'mê êzdiya; k'itêbê dînh'ebandinêye pîroz gere bêne nîvîsê û rastiya qirar û giliyê Xudê û sozê êzdîtiyêye t'eze di nava cimae'tê da fire bê bela kirinê.

Di qewl, beyît', di'a-dirozgê êzdîtiyê da êp'êce soz û gotinê qenc bona êzdiyê her zemanî têne gotinê. Ferze, zanê êzdiya derheqa wan tişta da binîvîsin û êzdiya pê bih'esînin, binga û kaklê êzdîtiyêye t'emîze e'slî bidine ber ç'e'va.



Institut kurde de Paris

nîne, dil dike p'îrtiyê bike, di xizmeta dînê xa da be, gere e'seyî xa t'emîz xayî ke û rast be, xa heqîqeta ayîna dînê Şîxadî û Êzdayê Sor bigire, dûrî ji te'mê dinê be, xêr na–şêxtî û p'îrtî kirina wan îmanfiroşî, dînfiroşî, Qewlfiroşî, cimae'tdoşî nîne, lê çiye?

Gava îzna şêx û p'îra t'une miriya sinet kin yane çava xaxa dibêjin:-"mor kin", lê hemikî evî toqî hil didine ser situyê xa, miriya sinet dikin û xêrê ji xayê mirî digirin–eva ne Qewlfiroşiye, lê çiye?

Derheqa çi bêjin û derheqa çi nebêjin. Meselê vî cûreyî îro di e'mrê êzdiya da p'irin. Xeberdan dibe hê êp'êceyî dirêj be. Lê çi jorê hate gotinê, ew jî t'êra serwaxt bûna êzdiyê fe'mdare dînp'arêz û rastger dike.



Institut kurde de Paris

gotina zana, Êzda(n) yanê Xudê mêrê êzdî ji hêvên çê kiriye û k'ê jî peyî giliyê Êzda(n) çûn, wana r'a gotin êzdî yanê yê ku Êzda(n)-Xudê nas kir, yê ku Êzda(n)-Xudê bawar kir, yê ku peyî gotinê Êzda(n)-Xudê çû û qebûl kir. Me'niya navê êzdî xa Xudênasiye.

Şêx Adî, çava me jor jî got, her tiştê êzdiyaye kemnare qenc hil da guhast, navê sirmaniyê-e'rebî danîne ser Melek û Xudanê êzdiyaye kemn û bi destê zorê dane qebûl kirinê. Di ulmê Şîxadî da navê Xudanê Tav-Rojê kirine Şems, navê Xudanê Sîn-Hîvê kirine Ferx(Ferx-êd-Dîn), navê Êzda(n) kirine Êzîd wek navê xelîfê sirmaniyê.

Di zemanê me da we'dê ulm û qirarê şêx Adî derbaz dibe diçe. Civaka êzdîxanê, H'ed û Seda şêx Adî belayî dibe û tê guhastinê. E'detê kal-



Institut kurde de Paris

bava jî pê r'a tê guhêzê. Borc kirina t'erîqetiyê, bi zorê şêxtî kirin û p'îrtî kirin îro bêfeyîdeye û t'u k'arê nade pêşk'etin û zêde bûna êzdiya.

Civaka êzdiya(êzdîxane) gere ve be, teng nebe. Îro, Êzdî peyî Ferzê xûşk-birê axretê kêm diçin û lazim bûna wî nabînin. Dibêjin: k'ê jî bîr-bawariya êzdiya – sonda ber Êzda(n), Tavê, Hîvê, Sitêrka Sibê qebûl dike, bila ser ç'e'va qebûl ke û bibe êzdî. Dinê-a'lem vedigere ser h'ebandina êzdiya, sonda Melekê Tav û Sînê, nîşanê xa dikine Roj-Xudanê Tavê.

P'are ve kirina civaka êzdiya (êzdîxanê) angorî sozê şêx Adî êdî t'u xêrê nade t'ifaq û yektiya êzdiya. Wê usa jî xûna êzdiya şêlû biye û bikî-nekî êdî nayê t'emîz kirinê.

Sond û h'ebandina êzdiyaye h'eqîqetêye-yek Xudê (Êzdan), nîşan li e'rşê e'zmana-Tav,



Institut kurde de Paris

Hîv(Sîn), Sitêrka Sibê (Gilavêj)-e, li e'rdê jî nîşana, nûra Xudê (Êzdan) – agire (kuç'ik).

Ji êzdiya, k'ê jî dil dike xizmeta dînê xa bike, bibe micêvrê Kuçikê Êzdan (Xudê), bibe dîndar, peyî qirarê rastiya Êzdan (Xudê ) here, xa ji dûrî te'mê dinê bigire, bibe hosta û mevla êzdiya r'a di dereca dîn-h'ebandinê da, ew jî r'êye bibe t'erîq bona êzdiya.

Di zemanê berî derk'etina şêx Adî da merivê xizmetk'arê ber kuç'ikê r'a êzdiya digotinê K'oç'ek.. K'oç'ek ew bende bûn yê ku ber kuç'ikê ocaxa Êzdan-Xudê qulix dikirin. K'oka xeberê Kuç'ik û K'oç'ek yeke. H'etanî niha jî xebera k'oç'ek di zimanê êzdiya da hatiye xayî kirinê. K'oç'ek dibêjine wan merva yê ku t'emîzin, sofîne, zanene, h'ek'îmin, remildarin, qulixçiyê dînê xane, dilpaqîj û dilovanin,



Institut kurde de Paris

piştovanê k'esîb-k'ûsîbanin, ser riya rastiya Xudê sekinîne, xêrxazê cimae'ta xa ne.

Lazime K'oç'ekê êzdiyaye e'slê berê der k'evin û rastiya Êzdan-Xudê cimae'tê ra bêjin. K'oç'ekê êzdiya lazime xayê k'itêb û deft'erê pîroz bin, di'a-dirozgê, qewl-beyît'ê êzdiya ser zimanê dê bidine t'eze kirinê.

Eve r'ya xilas bûn û xayî kirina êzdîtiyê û êzdîxanê. Êzdan-Xudayê me vî dengî dike guhê me da, k'iriyameta xa bi reng û avazê cûre-cûreyî va xa me r'a dide xiviyanê û riya qenciyê nîşanî me dide, bi destê deng û xetê dîndarê xêrxaz.

Xulese, êzdîtiya me, bi guhastinê Ayîna dîn û qirar-e'det va, bêgilî wê pêşk'eve, dînbawariya êzdiyaye t'ezeveçêkirî h'emû êzdî jî wê qebûl kin û bawariya xa pê bînin. Sîmbola (nîşanê)



Institut kurde de Paris

dînê êzdiya h'ebû û heye jî e'zmana Roj, Hîv, Sitêrka Sibê, e'rdê jî agir-kuç'ikê nûra Xudê.

Xudaê-Êzdanê Mezin bi wan nîşanê xa (Tav, Hîv, Sitêrka Sibê) em xelat û xebîr kirine. Qewat, zoraya û k'iriyameta wan bê h'ed û sede.

Me'niya wê yekêye, wekî t'irka (sirmaniyê) Nîşanê êzdîtiyêye E'rşê Êlî (kosmosê)-Hîv û Sitêrka Sibê ji dînh'ebandina êzdiya hil dan û şiklê wan danîne ser meçît û mizgevtê xa, şikilê Hîvê û Sitêrka Sibê ser bêraqa dewleta T'ûrk'îyayê çê kirin û pê qure dibin. Rengê sor jî ji Êzdanê Sor girtin û bêraqa xa bi vî rengî reng da kirin.

Lê, bawariya we hebe, Hîv û Sitêrka Sibê Xudanê mene, sor jî rengê Roja meye, êzdî gere lê bibine xayî û îznê nedin t'ukes ji me bistîne.

Institut kurde de Paris

Hine bedîl (waxt) wê derbaz bin û wê r'a be xudannederkî şikestiyê dîn, wê pêşiya êzdiyê dîndar û welatevîn k'eve, paşî heqas cefa, zulm, tengasiyê, bêç'ariyê, êzdiya ji xerîbiyê wê vegerîne ser e'rdê kal-bava. Li k'u ji bi qewat û k'omeka Êzdan êzdîxane wê bigîhîje mirazê xa, êdî bê xayî û bê e'rd namîne. Ew roja e'zîz nêzîk dibe.

Eva nivîsa bona pêşeroja êzdiyaye bextewar hatiye çê kirinê, bi nêta xêrxaziyê û dînh'ebandina êzdiyaye rastiyê, wekî heq riya bawariya Êzdan bigîhîje êzdiyê her dera.

Eva Soza (Qewla) be'sa h'alê bîr û bawariya, Ol û Erk'anê êzdîtiyê dike di dewra îro da.

Her sebeqe ke wî Qewlî, her xeteke sebeqa, her gilîke xeta, bawariya xa qencî r'a bûn û pîrozî serk'etina êzdîtiyê li h'emû dinê-a'mê tîne. P'êşk'êşî wan dîndarê êzdiyane, wan derdk'êşê



Institut Kurde de Paris

êzdîtiyêne k'ê jî bi ç'e'vê rastiyê û h'elal, bi însafa Xudê giliyê di p'irtûkê da nivîsî wê bibînin.

Bawariya min t'ek ewe, wekî zemanê wê bê da, pêşeroja me da, seba ku êzdîtî da nav me da unda nebe û r'a nebe-neh'ele, êzdiyê ku dînh'ebandina xa h'iz dikin, wê r'a bin, qirar-qanûnê êzdîtiya şêx Adî danî bû û yê ku îro naêne xayî kirinê û êzdî wan êdî qebûl nakin, angorî dewr-zemanê îro guhastinê têkne di nav wane da, dînh'ebandina êzdiya ji tiştê nebaşer t'emîz kin, binga û kaklê h'ebandina êzdîtiyêye berî hatina şêx Adî derxine li meyîdana bîr û bawariya êzdiya, p'irtûkê dirozgê pîroz bi zimanê dê binîvîsin, bîr û bawariya êzdiyaye t'ezekirî wê bela kin û bidine qebûl kirinê.

Êzda(n) xudênasî û borcnasiya we ber bi Xudê kêm neke!



Institut kurde de Paris

## SOZÊ HEQÎQETÊ

1. Ewa Qewlê dewr-zemanê meye,
Heq-neheqiya êzdiya tê da heye,
Xa davêjine ser p'işka şile'tê,
sê h'erfê me t'ev hileye.

2. Ewa Qewla Qewlê h'eqîqetê,
Baş guhdar kin gotinê vê xetê,
Xudê k'iriyamet dayê êzdî lê
bikin h'izretê.

3. K'ê vî Qewlî r'a bibe yare,
Nevsa wî ber Xudê t'ucar nabe xare,
Te'lî-tengiyê dîn wê bibîne, hilde
ser xa toq û bare.



Institut kurde de Paris

4. Dema ez mirim, ser min nekin axîn û girîne,

Wê e'rd bit'eyîse, e'zman bike gurîne,

Birûskê lêxe, sitêrk tarîk bin, bimînin bê nûrîne.

5. Av wê r'a be, babelîsk her tiştî hilşîne,

Nûr wê bişewitin, birijin ji e'rşê e'zmîne,

Bende wê bimîne t'ek gumana Xaliqê A'lemîne.

6. Wê siyar be Mamereşane,

Xudanê ba û birûskê, maşê şeşane,

Wê seranser hev xe h'emû dayîrê e'rşane.



Institut kurde de Paris

7. Şîna min bikin vek şaya qîz û kurîne,

Laç'ikê reş ve kin, girêdin gevezê reng sorîne,

Dengê saz derxin, minet ne def-şibêbîne.

8. Dîlana bêjin, ne h'evcê dîlokê şîne,

Ne jî qewl-beyît'ê şêx û p'îrê zemanîne,

Banga min yeke: "Hola, hola Sor Êzdîne!"

9. Ser min k'om bin kinêz, lêzmê hewarîne,

Dest nedine xumriya, ne bêjin em çira mane û k'îne,

Bik'evne simayê dor qalbê minî bê rih'îne.

Institut kurde de Paris

10. Ber hev bisεqirin Roj û Hîve,
Ciniyazê min dayînin ser t'extê h'işke bê livîne,
Ç'ara min hûn bibirin sêzdeh mêtr û nîve.

11. Dem hat ezê herme ber ferware,
Heq riya Xudê raste ne bi xare,
K'oç'ê me dik'işin, kes namîne wan ciya, wan ware.

12. Qendîl heye mala Xudêye,
Minetk'arê wêne em rû e'rdêye,
Qalib dimîne, rih'ê qenca diçne li wêye.

Institut kurde de Paris

13. Gava rih' ji qalbê min bifire,

E'rd û e'zman hev r'a deng bikire,

Birûskê çarde tebek jor bi jêr bibire.

14. Ber Taûsî Melek e'babete,

Şev û roj min kir xizmete,

Şûna min ma bê kurînî zurete.

15. Zurete bê kurîne,

Bermaliyê min cot p'erîne,

Qedrê wan bigirin boyî xatrê

bavê Medînê, Gulçîne.

16. Wê sekinîne Gulçîn, Medîne,

Hêstirê r'ih'în dibarîne,

Institut kurde de Paris

Ya Xudayê Mezin, bav qîza r'a

çiqasî şirîne.

17\. Qedrê wan bigirin boyî bavêye,

Nebêjin bav çûye, k'ê li k'êye,

Ber Mîrê xa ezê di'açiyê we bim,

sonda bi navê Xudêye.

18\. Mix'arek hebû ciyê e'babetê,

Kanîk jê dik'işiya bi qewata qudretê,

Êzdiya xa mor dikirin ew bû ava cinetê.



Institut kurde de Paris

19. Şêx Adî cindiyê xa k'om kirin,

Qesta Mix'arê, Kaniya Sipî kirin,

Destûrî Xudê, Mêr-Meleka xa ziyaret kirin.

20. Laliş kirine warê Mîra,

Li wê danîn dîwana feqîra,

K'oç'ekê ber kuç'ikê nûrîn kirine

xizmetê p'îra.

21. Gotin: "Riya Mêrê Dîwanê heq û rastin!"

Ra bûn ol û erk'anê kemin guhastin,

Êzdiya r'a xêr û berek'eta Xudê xastin.

22. Şêx Adî h'ed û sed danî,

Ferzê biratiyê li hev anî,



Institut kurde de Paris

Sê h'erf sêvirand, êzdî pê wan

kirine bawar û reh'manî.

23. Şêx Adî, şêx Îsn mêrne çê bûn,

Ji wan k'itêb-deft'er çê bûn.

Qelem ji Ferxê Adiya girtin, xaş jê

t'êr bûn.

24. Nivîsîn k'itêb û deft'ere,

R'a dibûne ser membere,

Zimanê e'rebî, gotinê Quranê

êzdiya r'a kirin sozê herî bere.

25. Şêx Adî dînê Êzdan teng kir,

Mêr dora xa civand reng bi reng kir,

Bû p'êxember, êzdiya r'a bi navê

Xudê deng kir.

26. Şêx Adî ulm li Şamê hilgirî,

Dewrana dewran birî,

Ne got, rojekê zanîn pêş k'eve, aqilê

êzdiya ferzê wî danî nabirî.

27. Îro kes nemaye bik'işîne we minetê,

Êzdîno, werin bixûnin vê xetê,

H'erfê wî nesîh'etin, rojekê kêrî we tê.

28. Zemanê berê va bû,

Qelem êzdiya r'a gune bû,

Her çi şêx–p'îrê nexandî digotin, her ew bû.



Institut kurde de Paris

29. Îro êzdiya qelem hildane deste,

Ulmê dinê r'a kirine qeste,

Qedex'a xandinê bi ç'e'va dîtin bi qeste.

30. Îro ew bedîl der k'etin,

T'erîq û mirîd hev k'etin,

Şik birine Mêra, Mala Adiya r'a de'v
k'etin.

31. K'etine de'v Mala Adiya,

K'itêb derxistin xandiya,

Dane ber ç'e'va heq-neheqiya pisê Adiya.

32. Zemanê me ne t'u xêre,

Şêx û p'îr revîne ji lêre,

Êzdiya xa ve kirin dergê mizgevt û dêre.

Institut Kurde de Paris

33. Derk'etiye dewreke ser dewrêye,

Dînê êzdîtiyê dih'ele li dinêye,

Bira bawariya xa nayîne li birêye.

34. Êzdî k'înê hev r'a dik'işînin,

Ç'e'vnebar, zinêk'ar, delingşînin,

Lema jî mane bê heq, bê welat û şaneşînin.

35. Bira xêra birê qet naxaze,

ji hev direvin xal, ap û biraze,

Êzdî h'etanî ser wî aqlî bin, nagîjine t'u miraze.

36. Hilşiya h'ed û sede,

Qirara r'a heye we'de,

Institut kurde de Paris

Doza Mala Adiya ji êzdiya digire kêm

merde.

37. Îro nefsa gelek êzdiya xare, ne li jore,

Davêjine ser dînê xa qisê p'ir qore,

Dil nakin herne h'izreta Sult'an Êzdaê Sore.

38. Xerqe, K'ulik wê rizîne,

Havêtine ser mêzîne,

Şêx, p'îr, mirîd hev r'a bûne xal-xarzîne.

39. Dilê êzdiya biye bazar-sûke,

Şêx, p'îr, mirîd direqisin bindarûke,

Şile'tê r'a dizevicin,wana r'a dibin zava,

bûke.

Institut kurde de Paris

40. Cahêl nizanin çi îmanîne,

Ola şêx Adî, Mêra r'a bê derdîne,

Ji şêx û p'îra kêm mane şikestiyê dîne.

41. Edî e'babetî nakin Xerqeye,

Nizanin ew libsê Xudê bi xaye,

Naçine ber damana şêx û p'îrê xaye.

42. Mirîdan, şêxan, p'îran,

Ji zû va berdane fenê mîran,

Ne jî êdî e'babet dikin wan feqîran.

43. Taûsî êdî ne siyare,

Xaç' xa r'a kirine yare,



Institut kurde de Paris

Laliş, Şengal, Ç'iyayê Mişetê r'a

dibêjin ne t'u ware.

44. Sunet êdî ne yê wanin,

Ne rezin, ne jî rezvanin,

Sunet berdan, êzdî ne h'evcê wan ferzanin.

45. Îro ji şêx, p'îran ulmdar neman,

Kes nak'işîne derdê van deman,

Qewlbêj derk'etine zaneyê çendik sebeqan

46. Kêm dikin xizmetê vî dîne,

Waxt bê şêxtî, p'îrtî qet namîne,

Herç'î şêx Adî, şêx H'esen ava kirin,

wê k'okê da hilşîne.

Institut kurde de Paris

47. Şêx, p'îra xêr xa r'a dibirin,
K'ivş bibûn, nasebirin,
Xof, r'ema Êzdaê Sor, Melek Taûs kêm dikirin.

48. Di'a, dirozgê wan e'babetê,
Kes nema xaş mak ke şe'detê,
Ulmê şêx Adî û Mêra wê tê ber t'emametê.

49. Hîviya t'erîqan ne t'u ji hîviyane,
Mirîd dest ber didin ji Mala Adiyane,
Qedrê wan ber zêndiya k'et, dibine şêx, p'îrê miriyane.



Institut kurde de Paris

50. Hê şêx Zeyîdîn, şêx Al neyî sipar bûn,

Her pênc t'erîqe xa r'a de'vîdar bûn,

Ferzê biratîyê û merebtiyê r'a ne bawar bûn.

51. Wê diçe dewra şêxan û p'îrane,

Êzdî êdî naçine ber malê girane,

Qet nak'işînin minetê ji govek û e'slê t'erîqê Mala Adiyane.

52. Xelqê k'itabê îro jî sere,

Borîna wan tê li dinê her dere,

Vî zemanî da jî êzdî mane bê nivîs û deft'ere.

Institut kurde de Paris

53. Eva gunehê şêx û p'ira,

Dîwana xasa û feqîra,

Reşbelekek çê nekirin boyî e'babetê dergê

Mîra.

54. Ew xêra êzdî îro didin boyî saxane,

Ne Xudê r'a û rih'ê wan miriyane,

Van cûra naz-nemeta Êzdaê Sor qebûl

nake t'u waxt, t'u zemane.

Institut kurde de Paris

55. Xêra miriya bi goşt û de'n bî,

Şêx û p'îr lazim bc qenc bî,

K'êrê bidî situyê dewara xêrê her sunet bî.

56. Ger ne sunet kirî,

Xêra miriya h'eram kirî,

Xudê wê gunê nabexşîne, bê îman kirî,

57. Hûn bizan bin ehlê mirinê,

E'zîzê min qirarek kire axreta dinê,

H'etanî ciniyaz li male t'u nan naê danînê.

58. Mala mirî bê nan bibî,

Hewarî bi qonaxê cînara dibî,

Gunekî girane rex qalbê mirî nanxur dibî.



Institut kurde de Paris

59. Ew k'asê şeravê hûn vedixwin, ne yê Êzdaê
Sore,
Ne jî dak'etiye ji e'rşê jore,
Ne jî şêx Adî û Mêra danîne ser more.

60. H'alê me êzdiya îro h'alê denûne,
K'ubariyê qirarê dîn dikin k'af û k'ûne,
Em çi îro unda dikin êdî venagere ji
ç'eva birêjin hêstir û xûne.

61. Şevekê xewnê E'zîzêm bû dîhare,
Dengek ji e'zmana ser min da hate xare,

Institut kurde de Paris

Go: "Evî toqî hilgire, xelqê min vegerîn

ser riya heq baware!"

62. E'zîzê min got: "Rabe, here,

Çarnikalê diniyayê seranser bigere,

K'oç'eka ra ke, qirarê min bila bigîhînine

êzdiyê h'emû dere!

63. Bêjin: "Ez Xaliqê wanim,

Bê şirîk û bê hevalim,

Herç'î êzdiyê xizmeta min bike,

ber dilê wanim!"

64. Şev û roja ez vê fikarê bûm,

Dayîna Xudê nuxtê vê surê bûm,

H'etanî qedem guhast xizmeta ber dergê
vê durê bûm.

65. Qewlê min bibih'ên gelî guhdêra,
Wê ji me derên xudanê xêra,
Ser at'qata Êzdaê Sor wê vegerînin
cindiya û mêra.

66. Werin hûn xayî nedera,
Banga Êzda bînin her dera,
Tav û Sîn Xudanê zorin, nedine t'u dîndera.

67. Dînê me dînekî heq û raste,
Kuç'ikê xa t'u dema nedida guhaste,
Mayîna me t'enê ser p'işka êzdîtiyê dixaste.

Institut kurde de Paris

68. Wê derk'evin k'oç'ekê heqîqetê,

T'emîziya dîn bikine misilh'etê,

P'êxemberek wê rabe bona rastiya dinê û axretê.

69. Wê k'ivş bin xudannedere,

Paqîjiya dîn wê derînin li dere,

Êzda, Taûs, Tav, Hîvê û Sitêrka Sibê pîroz kin her dere.

70. Wê rojek bê bive gaziye,

Êzdî wê xa dûr xin ji şêx -p'îrê xal-xarziye,

Ber Bînaya Ç'e'va wê diyar bin

k'oç'ekê êzdîxane jê raziye.

71. Roj hat êzdî wê ji gotinê e'rebî k'ûvî bî,
Dîwana dînî bê h'ed û sedî bî,
Ciyê her pênc t'erîqa yek k'oç'ekê şikestî bî.

72. Xiyalê dilê min Êzdaê Sore,
Taûsî melekê e'rşê jore,
Tav, Sitêra Sibê û Hîva dinê ser more.

73. Sê nave yek beşere,
Navê Şems, Taûs, Êzda sere,
Ew Xudayê h'emû êzdiyayî herî here.

74. Sura dînê Êzda hildin h'esêva,
Mak kin qewla, binîvîsin k'itêva,

Institut kurde de Paris

Ji wan h'erfa hûnê bibînin xoşî, şayî û

e'cêva.

75. Eva Qewla p'ayê Tav û Sîne,

Ne ji k'itavê Încîl, T'ewret û Quran-yasîne,

Xudê ew k'iriyamet daê, xet û rêzê

K'eremê Anqosîne.

## Dirozga K'eremê Anqosî

Xudê bidî k'iriyametê,

K'erema xa, qelema qudretê,

P'ir kî risq û berek'etê,

E'rdê çê kî cinetê,

Hildî k'ubarî û zinetê,



Institut kurde de Paris

Me bikî maşoqê xa h'izretê,

Ya Dinê û ya Axretê,

Sifrê t'ijî kî bi naz-nemetê,

Qebûl kî xêr-xêratê,

Qurbanê ber Mêr-Miliyak'etê,

Ber Te dikin di'a-e'babetê,

Ji me ve kî dergê heqîqetê,

Me dûrxî ji p'işka şile'tê,

Me kêm kir, Tu zêde kî risqetê,

Remê bidî vê cimae'tê,

Mal-mezelê em tê da.

qebûl be xêr,

Qebûl be qurban

Eva nan-ava di'a kirî

Bi navê Xudê u Tausî Melek.

Amîn!

# Me'niya xebera "Qewlfiroş"çiye?

Di h'emû dewr-zemana da, di h'emû dewlet-dîwana da, di h'emû milet û cimae'ta da hebûne û îro jî hene merivê bi navê firoşçî yanê bendê usa yê ku bona k'ara nevsa xa tiştekî difiroşin. Mervê wî cûreyî r'a dibêjin firoşçî.

Beniyadem wekî ji birçiya nemira, bona ku e'bûra xa bikira, çi dik'ete destê wî, çi pê r'a dihat, ew jî difirot.

Hine meriv jî bona zêde û p'ir kirina hebûna xa, wekî bibe dewletiyê zengîn û h'uk'umdar, dibû firoşçî. Lema jî çê bûn: nanfiroş, malfiroş, xanîfiroş, dewarfiroş, pezfiroş, e'rdfiroş, zevîfiroş, welatfiroş, êlfiroş, e'şîrfiroş, k'itêbfiroş, qewatfiroş, canfiroş û yê mayîn.



Institut kurde de Paris

Hene meriv, wekî ji destê t'unebûnê dimînne neç'ar, xandin-zanîna xa difroşin yanê zanîna xa bona zêde bûna malê xelqê û k'ara wan difiroşin dikine xizmeta wan. Merivê vî t'eherî r'a dibêjin: zanînfiroş, ulmfiroş.

Hene merivê usa jî, yê ku bona nanê zikê xa, xaş kirina h'alê xa û tirsa canê xa dîn-bawariya xa difroşin, t'erka dînê kal-bavê xa didin diçin digîjine dînekî mayîn. Wan meriva r'a dibêjin: dînfiroş yanê îmanfiroş. Îmanfiroşe ew bende jî, k'îjan jî bona k'ara xa û razî bûna xa ayîn-qirarê dînê xa diguhêze, p'êpes dike û bi vî t'eherî dih'erimîne. Ît'bariya û bawariya merivê îmanfiroş t'une, ew zinêk'are.

Di qewle "Sêx û Aqûb" da tê gotinê: "Peza sitewir medoş, nebe hevalê îmanfiroş!"

Institut Kurde de Paris

Em werine ser xebera "Qewlfiroş" û derheqa wan çend şêx û p'îra da be's kin, k'îjan jî îro mevlatiyê û hostatiyê dikin, diçine ser miriya, miriya dişûn, miriya heq dikin, qewl, di'a-dirozga dibêjin û xêrê ji destê xayê mirî digirin.

"Qewlfiroş" ew şêx û p'îrê êzdiyanin yê ku xa bi rê û rizmê ayîna dînê êzdîtiyê va rast nagirin, xa t'emîz xavî nakin û bona k'ara nevsa xa diçin ciyê t'erîqê h'eqîqetê digirin û qewl-beyît'ê Şîxadî dibêjin, pê wê yekê va xêra t'op dikin û t'enê dikine loşî xa.

Wan êzdiya r'a yê ku ayîn-qirarê dînê êzdîtiyê, Ferzê xûşktiyê û biratiyê, Sê Herfa û ulmê Şîxadî û Mêra xaş pê dizanin, xêrxazê êzdîxanê û şikestiyê dînê xanin, wana r'a gere her tişt fe'mdarî be, gere xa rastiyê bigirin, bawariya xa rastiyê bînin û rastiê qebûl kin,



Institut kurde de Paris

bona navê ĉzdîtiyê û pêşk'etina dîn eşkere kirina kêmasiya netirsin.

Kes miqabilî kesî nîne û kes naxaze t'erîqet ji nava êzdiya rabe. Xaziya me t'ek rastiya ber Xudêye û t'emîz bûne di xizmeta dîn da.

Îro gava merivekî dewletî dimire, ser şîna wî şêx û p'îrê qewlbêj t'ijî dibin. Lê wekî merîkî k'esîb, desteng diçe rema Xudê, qet t'erîqekî qewl bêje, nayê xiviyanê.–Kirinê ha Qewlfiroşi nîne, lê çiye?

Waxta ne şêx û p'îrê mala mirîne, lê hemikî rêz dibin û xêrê ji destê xayê mirî digirin-eva yeka Qewlfiroşî nîne, lê çiye?

Gava êzdîk çûye şile'tê r'a zewiciye û dema r'ema Xudê tê ser, şêx û p'îr diçine ser ciniyazê wî merivî, ulmê Şîxadî dibêjin, t'esmîlî e'rdê



Institut kurde de Paris

dikin û xêrê hil didin–eva ne Qewlfiroşiye, lê çiye?

Waxtê t'erîq ji destê zarê dînê êzditiyê derk'etî (şile'tê ra zewicî) xêrê hil didin û qewl–beyît'a dibêjin-eva Qewlfiroşî nîne, lê çiye?

Gava şêx û mirîd, şêx û p'îr, p'îr û mirîd hev zewicîne û şêx û p'îr diçine ser ciniyazê merivê usa, bi navê Şîxadî qewla dibêjin û xêrê hil didin-eva ne Qewlfiroşiye, lê çiye?

Waxtê şêx û p'îr diçine ser ciniyazê yekî bavêzdiye xaçkirî, peyî k'eşîş r'a ser da qewl-beyît'a dibêjin, qirarê Şîxadî diqedînin, xêrê hil didin û qet xofa êzdîtiyê nak'işînin--eva Qewlfiroşî nîne, lê çiye?

Gava şêxê Şêxûbek'ira û şêxê Şemsa (Qat anî û Şemsanî) hev dizewicin, lê hemikî



Institut kurde de Paris

diçine ser miriya şêxtiyê dikin, ulmê Şîxadî dibêjin û xêra hil didin–eva ne Qewlfiroşiye, lê çiye?

Waxtê şêx û p'îrê ji sibê h'etanî êvarê destê wan di nava goştê beraza (xinzîra) da ne, kalbasê ji gostê berazaye cûre-cûreyî dixwin, t'evî şile'tê û mirîdê xa ra dibin–rû tinên, peyî r'a diçine ser miriyê êzdiya, bi navê Şîxadî qewl–beyît'a ji Xezîna Şîxadî dibêjin û xêrê hil didin–eva Qewlfiroşî nîne, lê çiye?

Gava hine êzdî r'e û rizmê dînê xa digivêzin, e'det veldigerînin, mesele, ser p'iya ji malê derxistina ciniyaz h'etanî devê gorê, şêx-p'îr jî pêşiyê dik'evin, ulmê Şîxadî dibêjin, qet t'alaşê nak'işînin û xêrê hil didin–eva ne Qewlfiroşiye, lê çiye?

Institut kurde de Paris

Waxtê p'îrek kuç'ikê xa, cidê xa, acaxa xa digivêze, diçe ser miriyê êzdiya, qewl-beyt'a ji Xezîna ulmê Şîxadî dibêje û xêrê ji destê xayê mirî digire–eva Qewlfiroşî nîne, lê çiye?

Gava xayê miriyê êzdiya dewsa "Xêra mirî" di rêstorana da Xêretxanê ve dikin, me'sî, xerzê me'siya, şîle û naz-nemetê sifira xêrê r'a necayîz t'ijî dikin, şêx û p'îr serê jorê rûtinên, t'erqînê û di'a–dirozgan dibêjin û xêrê hil didin–eva ne Qewlfiroşiye, lê çiye?

Waxtê ser sifira xêrê yane Xêretxanê t'erîq k'asê e'şiq û salxiya, e'şiqê Gurcistanê, Roja 9 aprêlê, salxiyê hine merivê pêsekiniye xayîp'ere, vedixun, e'det-qirarê, r'ewşa sifira şînê tînin digihînine qeyîdê nanê şayê, ser da jî di'a dikin, t'erqînê dixûnin–eva Qewlfiroşî nîne, lê çiye?



Institut kurde de Paris

Gava şêx û p'îr xaxa sinet kirî nînin, lê diçin dewara xêrê şerjê dikin, qewla, t'erqînê ser da dibêjin, dia dikin û derê sîtlê goştê xêrê vedikin, qet îmana bavê xa natirsin–eva ne qewlfiroşiye, lê çiye?

Waxta mala mirî e'detekî t'eze-"xêra çilê mirî" datîne, şêx û p'îr diçine serê jorê, qewla, t'erqîna Şîxadî dibêjin, xêrê hil didin û pê vê yekê va "çilê miriya" êzdiya r'a didine qebûl kirinê, qirarê t'eze êzdiya r'a çê dikin–eva Qewlfiroşî nîne, lê çiye?

Gawa şêx û p'îr t'enê rojê şînê û roja t'op kirina "Xêra salê" diçine ser mirîdê xa, lê di xaşiyê da qet derê malê mirîdê xa venakin–eva ne Qewlfiroşiye, lê çiye?

Çaxê şêx û p'îr dik'evine bin bandûra, bin qolê merivê xayîp'ere-dewlemendê usa, k'îjana



Institut kurde de Paris

jî h'ed û sedê dînê êzdiya h'erimandine û ji r'ê û rizmê êzdîtiyê derk'etine, peyî giliyê wan diçin, bona xastin û k'êfa wana qirar û edetê êzdîtiyê diguhêzin, ulmê Şîxadî bona p'era ber wana r'o dikin û xêrê ji destê wan hil didin–eva Qewlfiroşî nîne, lê çiye?

Gava sazbend û dengbêjê şile'tê tînine ser miriyê êzdiya û sae'ta guhê xa didine wan, peyî r'a şêx û p'îr diçin ser ciniyaz qewlê Şîxadî dibêjin–eva ne Qewlfiroşiye, lê çye?

Çaxê şêx û p'îr xêr-xêratê t'op kirî t'enê dikine xurê xa û bona lazimiya xa xerc dikin, qet arîk'ariyê nadine mirîdê belengaz û desteng, tiştekî bona xayî kirina û qewî kirina h'ebandina dînê êzdiya nadin, tiştekî jî nakine "K'eşkûla Şîxadî" û naşînine ber Lalişê–eva Qewlfiroşî nîne, lê çiye?

Institut kurde de Paris

Gava şêx û p'îr r'ê pêşiya êzdiya nagirin û şîret nakin, wekî neçin negîhîjine dêra Xaç'p'arêza, nebine Yex'ovî, Pirotêstant û ser da jî xaxa xa vê r'ê digirin diçin–eva ne Qewlfiroşiye, lê çiye?

Waxtê du p'îrê nû(t'eze) derk'etî ser şîna hev dik'evin û hev bêhirmet û rezîl dikin bona hildana xêra û girtina mirîda--eva Qewlfiroşî nîne, lê çiye?

Wekî şêx û p'îr derdê h'ebandina êzdîtiyê û t'emîzaya Ol û Erk'ane dîn, H'ed û Sedê, Sê h'erfa dik'işînin, dixazin bîr û bawariya êzdîtiyê bê xayî kirinê, lê çima pê wan xêra ku ji mirîdê xa distînin, k'itêbê derheqa ayîn, qirar-qanûnê êzdîtiyê nadine nivîsarê û bela kirinê, wekî cimae't heq riya dînê xa bizan be, xa wê



Institut kurde de Paris

r'ê û r'izma bigire û neçe negîhîje dîneki mayîn–eva ne Qewlfiroşiye, lê çiye?

Gava yekî êzdî-şêx be, p'îr be, mirîd be-diçe ser dînekî mayîn, ser dînê Xaç'p'arêziyê, Yex'ovayê, Kirîşnayîtiyê, paşî zemanekî para vedigere dibêje: "Ez dîsa êzdîme" û şêx û p'îr wana qebûl dikin, k'êleka xa didine rûniştandinê, dibêjin: "Meriv ji nîvê r'ê jî vegere, ne p'oşmane" –eva hilşandina qirara êzdîtiyê nîne, eva Qewlfiroşî nîne, lê çiye?

Waxtê şêxek, dê û bavê k'îjanî jî şêx t'emîzin û xûna wan şêlû nine, dixaze şêxtiyê bike, bibe micêvir û xadimê dînê xa, qulxî dînê xa bike, gere e'seyî xa t'emîz xayî ke, ser heq r'iya h'ebandina Êzdayê Sor baş bisekine û xa ji te'm û k'êfa dinê dûr bigire, wekî p'îrek, dê û bavê k'îjanî jî p'îrê t'emîzin û xûna wan şêlû



Institut kurde de Paris

nîne, dil dike p'îrtiyê bike, di xizmeta dînê xa da be, gere e'seyî xa t'emîz xayî ke û rast be, xa heqîqeta ayîna dînê Şîxadî û Ezdayê Sor bigire, dûrî ji te'me dinê be, xêr na-şêxtî û p'îrtî kirina wan îmanfiroşî, dînfiroşî, Qewlfiroşî, cimae'tdoşî nîne, lê çiye?

Gava îzna şêx û p'îra t'une miriya sinet kin yane çava xaxa dibêjin:-"mor kin", lê hemikî evî toqî hil didine ser situyê xa, miriya sinet dikin û xêrê ji xayê mirî digirin-eva ne Qewlfiroşiye, lê çiye?

Derheqa çi bêjin û derheqa çi nebêjin. Meselê vî cûreyî îro di e'mrê êzdiya da p'irin. Xeberdan dibe hê êp'êceyî dirêj be. Lê çi jorê hate gotinê, ew ji t'êra serwaxt bûna êzdiyê fe'mdare dînp'arêz û rastger dike.

Institut Kurde de Paris

Roja îroyîn, di nava êzdiya da, dereca Qewlfiroşiyê gîhîştiye beranberî me'niya xeberê Îmanfiroşî û Dînfiroşiyê. Dînfiroşî jî bela û xenîmê serê Êzdîxanêye.

Qewlfiroşiya îro di nav êzdiya da cî girtî, mecalê dide xeyîbeta hine t'erîqa bikin û wana r'a têk'evine şikê. Qewlê "Imanê" da tê gotinê:

"Ew bedîlê der k'evin,
Ew bedîlê li hev k'evin,
Ew bedîlê Mêra şik k'evin....
Ew bedîlê Mêra bivine şike...."

Îro ew bedîl, zeman derk'etiye û lazime ew şêx û p'îrê xizmeta dînê xa dikin, dixazin ser mevlatiya û hostatiya kal-bava bisekinin, gere ber Xudê û êzdîxanê e'seyî t'emîz, rast, h'elal û xayî îman bin.

Ew h'erf û xetê jornivîsî bona k'ara êzdîtiyê hatiye nivîsarê û wê kêrî êzdiya bê. Lema jî bi sebir û bênfire gere bêne xandinê û fe'm kirinê. Hêrs ç'eka mêrê çê û şikestiyê dîn nîne. R'astî gere nebe kelem (sitirîn) û ç'e'vê hineka da neçe, kor û sergêj neke.

Îro, dilê k'ê jî ser rewşa êzdîtiyê dişewite, gere bi navê Xudaê Mezin, Melek Taûs, Mêr û Miliyak'etê êzdiya r'astî, paqijî û qenciya dînê êzdiya eşkere ke û kêmasiyê xadimê, micêvirê ocaxê êzdîtiyê, yê ku îro xa datînine dewsa xasa û sofiya, veneşêre.

Bajarê T'ilbîsê, sala 1998

Institut kurde de Paris

K'eremê Anqosî

Çarşema Sor

(Roja Melek Taûs)

Ya, Taûs, tu Melekê e'rşê jorî,
Te dinê çê kiriye ji dur'a sipiye,
Tu Xudavendê Çarşema Sorî,
Remê didî êzdiya ji e'rşê êliye.

Îro çarşeme,
Çarşema Sore,
Roja Taûsî Melek,
Çarşema qirarê.

Çarşema serê meha Nîsanê,
Taûs Laliş danî bona nîşanê,
Nûr jor da daxist, xa da xiwiyanê,
Êzdî lê şa bûn, pê r'a kirine e'yîda Qurbanê.

INSTITUT KURDE de PARIS · BIBLIOTHÈQUE

Îro çarşeme,

Çarşema Sore,

Roja Taûsî Melek,

Çarşema qirarê.

Te dinê xemiland h'ezar avaz û renge,
Ya, Melekê qenciyê, xaş tê ji te denge,
Nav dik'irê teye Enqerî p'errenge,
Taûso, tuyî p'adşayê minî serzenge.

Îro çarşeme,

Çarşema Sore,

Roja Taûsî Melek,

Çarşema qirarê.

Institut kurde de Paris

# BÎBLIOGRAFIYA

## "P'IRTÛKXANA ÊZDIYA"

1. Şêwra min milet r'a rûniştvanê rêspûblîka Gurcistanê r'a. s.1990

2. Bangîna min milet r'a (bi zimanê ûrisî). s.1990

3. Bangîna min k'urdê bajarê T'ilbîsê r'a (bi zimanê ûrisî). s.1989.

4. Çend gilî derheqa dînê k'urdaye êzdîtiyê da (bi zimanê ûrisî). s.1992.

5. Navbenda êzdiyaye dînî û civakî (bi zimanê ûrisî). s.1993.

6. Bangîn êzdiyê Gurcistanê r'a. (bi zimanê ûrisî). s.1994.

Institut kurde de Paris

7. “Ferza biratiyê” li bal êzdiya. H’ed û Sed. Navê malê şêxa û p’îra, Sê h’erf, T’erqîna biratiyê, elîfba. (bi zimanê ûrisî). s.1996.

8. 80 saliya gênosîda êzdiya di Osmaniyê da (bi zimanê ûrisî). s.1997.

9. E’lametiya navk’arê civîna êzdiyê bajarê T’ilbîsê derheqa 80 saliya genosîda êzdiya (bi zimanê ûrisî). s.15.061998.

10. Roja xezebê. K’eremê Anqosî. Şêr.s.1998.

11. Ezî êzdîme. E’zîzê Îsko. Şêr.s.1998.

12. Dirozga êzdiya. Dirozga K’eremê Anqosî. s.1998.

13. Elîfba bona êzdiya. s.1998.

Institut Kurde de Paris

14. Rast û ç'ep ya êzdiya. s.1998

15. Ji xezîna ulmê Şîxadî. Qewl û beyît'. s.1998.

16. Me'niya xebera "Qewlfiroşî" çiye? s.1998.

17. Ayîn û qirarê dînê êzdîtiyê. Zargotina şêx Xelîfê Şemsanî. s.1999.

18. Çarşema Sor-Roja Melek Taûs. K'eremê Anqosî. Şêr.s.1999.

19. Çi êzdiya r'a gune-qedex'eye? (bi zimanê ûrisî) s.1999

20. Êl û berekê êzdiyê Gurcistanê û Almaniyayê. ? (bi zimanê ûrisî) s.1999

21. Bangîna min êzdîxana Gurcistanê r'a. (Mirov t'enê di welatê xa da, li ser axa xa azaye). s.1996.

Institut Kurde de Paris

## RİZMA P'İRTÛKÊ

1. Êzdîtî dunê îro sibê ........................................3

2. Soze (Qewlê) heqîqetê........................................36

3. Dirozga K'eremê Anqosî........................................59

4. Me'niya xebera "Qewlfiroş" çiye?........................61

5. Çarşema Sor (Roja Melek Taûs)........................75

6. Bîbliografiya "P'irtûkxana êzdiya"......................77

Institut Kurde de Paris

# КАРАМ-е АНКОСИ

# ЕЗИДСТВО В ПРОШЛОМ, В НАСТОЯЩЕМ, В БУДУЩЕМ

МОЛИТВА ОБ ИСТИНЕ

(на курманджийском языке)

# KARAM-e ANKOSI

# The Past, the Present and the Future of Yezidism

(In Kurmanji language)

Езидская библиотека

Yezid library

Тбилиси 1999 Tbilisi

Institut kurde de Paris

*Publishing House „Chronography“*
*Tbilisi. Georgia*

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

NÎŞANÊN DÎNH'EBANDINA ÊZDIYA LI E'ZMANA: ROJ (TAV, ŞEMS), HÎV (SIN, FERX), SITÊRKA - SITEYÎRA SIBÊ (GILAVÊJ, MELEKÊ TAV Û SÎNÊ, MELEK TAÛS)